 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)* |  *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 9

# Rah û damarên Atûnî û Zerdeştiyê di kûraniya dîrokê da

Me gotibû ku *Atûnî* û *Zerdeştî* du ayînên yekxwedayî ne û ew qaşa rojê wek zembola xwedayê yekane dibînin û ne wek xweda; wek ku hin kes guman dikin. Û bi me ra derbas bû ku taybetmendiya van herdu ayînan ronahî û xweşbînî ye; di wan da ne reşbînî heye, ne jî doza bikaranîna zorê, xwînrêjî û talankirina gelên din heye. Tenha maye ku em li sedemên diyardeyên hevbeş yên van herdu ayînan bikolin, ka gelo bandora yekê ji van li ya din bûye? Yan ev herdu di bin bandora baweriyeka hên ji wan kevintir da bûne?

Berî ku em bersiva van pirsan bidin, ka em van ronahîkirinên dîrokî pêşkêş bikin, belkî ev me ji naskirina rastiyê va heya bi radeyekê nêzîk bikin.

## Hin ronahîkirinên derbarê rah û damarên Zerdeştiyê:


**Ronahîkirin - 1**: Di heyamên kevnar da, di destpêkê da, bawerî bi rojê wek xweda hebû. Di pey ra roj bû zembol ji bo xweda. Ev bawerî di nav pir gelan da belav bûbû; ji rojhilat da, ji Japonê bigire heya bi *Hinûdên Amerîka* li rojava. Heya niha jî li Japonê baweriya ku *Mikado* (emperatorê Japonê) ji nifşên rojê (asîmanî) ye li wî welatî baweriya here serdare. Ji ber vê baweriyê qaşê rojê di nîveka alaya Japonê da hatiye nexşkirin.



Hin padîşahên Hindistanê jî kok û binyata xwe birine ser rojê. Padîşahên Misirê jî xwe wek kurên rojê hejmartine. Û wisa gelê Înka jî yê *Hinûdên Çermsor* li Amerîka angaşt dikirin ku ew kurên rojê ne, roj diperestin û jêra diçûn sicûdê, wek xwedayê herî gewre[1].

**Ronahîkirin - 2:** Li Kurdistanê jî, bi destpêka çarîkê dawî ji hezarsala duwem b.z. serdariya siyasî-çandî kete destê şaxê Ariyanî ji pêşiyên gelê Kurd. Bi gelemperî di hemû ayînên Ariyanî da roj zembola xweda bû. Li ba *Ariyaniyên Vîdî* li Hindistanê roj wek *Asûras* dihate binavkirin, û li ba pêşiyên Kurdan wek *Soryaş*, *Asora* û *Ahûra* dihate binavkirin. Li ba pêşiyên Kurdan navê rojê bi navê xwedayê rojê va hate girêdan; ji rojê ra "xûr" dihate gotin û di hin şêwezaravayên din da "hor" yan jî "sor" dihate gotin. Heya niha jî "Soran" navê


herêmeka gewre ye li Başûrê Kurdistanê, û peyva "xûr" jî di navê bajarê kurdî "Xûrem-Abad" da maye; yanê bajarê rojê; û her wisa di navê herêma "Hewreman = Xûraman" da jî maye. Heya vê rojê jî gelê vê herêmê ji alîgirên ayîna "Kakayî" ya şemsanî ne; wek şaxek ji şaxên *Yezdaniyê*[2].



(Erdnîgariya kelîja Horî)

**Ronahîkirin - 3:** Di her heyameka dîrokî da navê şaxê serdar û bihêz ji pêşiyên gelê Kurd diavêtin ser hemû şaxên din. Wek nimûne, di hezarsala sêhem b.z. da navê "*Sobarî = Sobartî*" serdar bû, di pey ra navê "*Gotî = Cûtî = Cûdî*" û li dora hezarsala duwem b.z. navê "*Xûrî = Horî = Ĥûrî*" yanê rojeyî (şemsanî) li gor baweriya şemsanî bû serdar; wek çawa îro ji alîgirên Kirîstiyaniyê ra "Kirîstiyan" dibêjin û ji alîgirên Îslametiyê ra Misilman dibêjin. Bi gelemperî di heyama "*Ĥûrî*" da "*çanda şemsanî*", ji wê jî "*ayîna şemsanî*" li nav pêşiyên gelê Kurd belavbûyî bû; bi taybetî jî di heyama "*Mîttanî / Ĥûrî*" da, ji ber ku padîşahiya Mîttanî di wê demê da piraniya axa Kurdistana mezin dihundirand.

**Ronahîkirin - 4:** Erdnîgariya "*Xûrî" (Sorî, Horî, Ĥûrî, Ûrrî)* û çanda xûrî ji Madan ra bû dûnda û werese; tevî ayîna şemsanî ya ku di çarçewa xweda *Yezdan (Ezda, Mazda)* da dizîvire û qaşê rojê zembola wî ye. Li gor gotûbêjên sereke, pêximber *Zerdeşt* di dawiya heyama padîşahiya *Madan* da xuya bûye. Wê hîngê, di sedsala 9-an b.z. da navê Mad naskirî û belavbûyî bû. *Emperatoriya Madan* di sala 550-î b.z. da li ser destê Farisan hate şikestin û *Zerdeşt* di hundirê *Ezdayiyê* da reform pêkanî; ew ji sihirbazî û efsaneyan paqij kir û hêşt ku ew di çarçewa xweda "*Ahûra-Mezda*" da bimîne; ev navê nû ji bo xweda "*Yezdan*" û roj wek zemboleka pîroz di *Zerdeştiyê* da ma.




## Hin ronahîkirin li ser rah û damarên Atûniyê:

**Ronahîkirin - 1:** Pêşiyên Misiriyan ne ji yek nijad û regezê ne. Dîroknas Wiliams Durant dibêje: "**Kes nizane Misiriyên pêşî ji kû hatine. Hin zaniyarên lêkolîner bêhtir ji wê baweriyê ne ku ew ji hêlekê da ji Nûbî, Eĥbaş û Lûbiyan (Lîbiyan) û ji hêla din da ji revendên Samî û Ermenan peyda bûne**"[3].

Hêjayê gotinê ye ku em bêjin: Dîroka pêşiyên Misiriyan vedigere pêş sala 3200 b.z. û ku Ermen di sedsala 12-an ya b.z. da ji Balkanan hatine û li warên "*Ûrartû*" (warê *Ĥûriyan*) di sedsala 7-an b.z. da bicih bûne. Farisan di sedsala 6-an b.z. navê "*Ermîniya*" avêtin ser "*Ûrartû*". Dîroknas Merwan El-Mudewer dibêje: "**Ermîniya bi vî navî nedihate naskirin... ev navê Ermîniya wek ku em îro nasdikin tenha piştî salên 550 - 521 b.z. hatiye lêkirin**"[4]. Ji lew ra, peyva "*Ermen*" ku W. Durant gotiye, bi maneya rûniştivanên welatê *Ûrartû* ye ku hinek ji pêşiyên Misiriyan ji wan gelên ku di hezarsala 4-an b.z. da ji welatê *Ûrartû* bûn.

**Ronahîkirin - 2:** Di destpêkê da Misiriyan perestî ji xweda "*Ĥûr*" (*Ĥûris*) ra dikirin û ev xweda di dirûvê mirovekî da bû ku seriyê wî seriyê şahînan bû. Li dor sala 3000-î b.z. perestî ji xweda "*Ĥatĥûr*" (kebaniya xweda "*Ĥûr*") ra kirine û bawer kirine ku ew xwedaya asîmane. Ev hin caran bi dirûve jinekê ku seriyê wê wek şahînane nexişkirine. Li ser seriyê wê di navbera du qoçên (quloçên) çêlekekê da bi qaşa rojê xemilandine[5].

Li dor sala 2400-î b.z. ji xwedayê rojê "*Reh*" [ رَعْ] ra perestî kirine. Ev xweda bi dirûvê mirovekî bi rîşale ku tacek bi dirûve qaşa rojê li seriyê wî ye û marek li dorê hatiye gerandin. Padîşahên Misirê bi xwe nav li xwe kirine "*kurên Reh*" û bajarê "*E'yn-Şems*" (10 km li bakur rojhilatê Qahîreyê) li ser navê vî xwedayî ye ku di hin deman da wek "*Atûm-Reh*" jî hatiye binavkirin[6].

| | | |
|---|---|---|
|  xweda Reh |  xweda Ĥathûr |  xweda Ĥûr |

**Ronahîkirin - 3:** Li dor sala 2060-î b.z. xweda *Amûn-Reh* dibe xwedayê malbata padîşahên Misirê. Maneya navê wî tê maneya "yê ji zanînê veşartî = yê ku nayê dîtin" û yek ji şêweyên navê wî "*Amîn*"e. Fer'ewn *Amûnĥûtebê Duwem* bi destê xwe şeş dîlên ji Sûriyayê yên serhildêr jêra serjêkirin û kirin qurban. Wisa tê xuyakirin ku şêweyê "*Amîn*" di Kirîstiyaniyê da dibe bi maneya "tika" (rica) ji xwedê û bi vê maneyê derbas Îslametiyê jî bûye. Ne ji xwerisk û adeta Misiriyan bû ku peykeran ji xweda ra di perestgehên rojê da deynin. Lê belê, bi derbasbûna sedsalan wêneyên xweda *Amûn* bi awayekî daringî durist kirin ku ew bavê Fer'ewne. Çîna oldar zêde bi ser vê mijarê da çûye û êdî sihirbazî û nivîsandina berbenc û hicêban pêkanîne; pir jin qaşo li pêş xelkê ku ew jinên xweda Amûnin, di rastiyê da, di perestgehê da ji xwe ra bi wan şahdibûn[7].

**Ronahîkirin - 4:** Kelîja oldarên xweda *Amûn* li Misirê pir xurt bû. *Amûnĥûtebê Sêhem* (1405 - 1367 b.z) hewl daye ku kelîja wan hinekê kêm bike û doza perestina xwedayê rojê kir û asta wî bilindtir kir, daku hinekê ji asta ayîna xweda *Amûn* kêm bike. Lawê wî *Amûnĥûtebê Çarem* (ji 1367 heya bi 1350 serdarî kiriye) wek şoreşekê li dijî ayîna xweda *Amûn* pêkanî, bi fermî ayîna xweda *Atûn* ferz kir û navê xwe jî kir "*Axin-Atûn = Exnatûn*". Wêneyê xweda *Atûn* ne bi dirûvê mirovekî, jînewerekî yan pûtekî, lê belê bi dirûve qaşê rojê hate nexişkirin ku tîrêjên rojê ji asîman da têne erdê û bi destên mirovan têne pêşwazîkirin[8].


pêşkêşkirina qurbaniyan ji xweda Atûn ra


xweda Amûn - Reh

Ev bû - pir bi kurtahî - rah û damarên ayîna *Atûnî* û ayîna *Zerdeştî* di kûraniya dîrokê da. Tenha ma ku em ji pêra li peywendî û bandora van herdu ayînan li ser hev bikolin.

Çarşembe, 27.05.2015.

## Jêder:

---

[1] M. F. El-Bedîl: Sihirbaziya Efsaneyan, rûpel 160.
[2] Ehmed Fexrî: Hin Lêkolîn li dîroka rojhilat a kevnar, rûpel 208. Wiliam Langer: Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/ 90 - 91. Cemal Reşîd Ehmed: Kerkûk di demên kevnar da, rûpel 33.
[3] Wiliams Durant: Çîroka şaristaniyê, 2/65. Û li Ehmed Fexrî binêre: Hin Lêkolîn li dîroka rojhilat a kevnar, rûpel 134 - 135.
[4] Merwan El-Mudewer: Ermen di seranserê dîrokê da, rûpel 82, 102. Û li Wiliams Durant: Çîroka şaristaniyê binêre, 2/303. Minorski: Kurd, rûpel 22.
[5] Dr. Muhemmed Beyyûmî Mehran: Zarên Israîl, 1/ 421 - 422.
[6] M. F. El-Bedîl: Sihirbaziya Efsaneyan, rûpel 143, 152. Samûel Nuh Kerîm: Efsaneyên cîhana kevnar, rûpel 29, 38. Herodot: Dîroka Herodot, rûpel 703 serinc. Seyed El-Qimnî: Pêximber Mûsa û rojên dawî yên Til Amarneh, C 1, rûpel 82.
[7] Dr. Ebduleziz Saleh: Rojhilata nêzîk ya kevnar, rûpel 137 - 139. Mouris Krousie: Dîroka şaristaniyan ya gelemper, 1/ 95. Wiliams Durant: Çîroka şaristaniyê, 1/80, 2/168. Gean Putro û hinên din: Rojhilata nêzîk, rûpel 353. Seyed El-Qimnî: Pêximber Ibrahîm, rûpel 130.
[8] Mouris Krousie: Dîroka şaristaniyan ya gelemper, 1/97.